HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

BULTENA HDP'Ê YA ÇANDİNİYÊ

SIBAT / 2020 HEJMAR:02

# MİJARA MEHÊ: EWLEHİYA XUREKAN

Ji bo paragrafa jêr em lînka 10'emîn an jî wêneyê di rûpelê 22'emîn de wekî çavkanî bi kar bînin!!! (https://storage.googleapis.com/planet4-turkey-stateless/2020/01/a314cc16-soframizdaki-tehlike-pestisit-greenpeace-rapor.pdf )

Di nav bermahiyên madeyên kîmyewî ku bandorê li tenduristiya mirovan û derdorê dikin di serî de pestîsît cih digirin. Pestîsît di hilberîna çandiniyê de wekî madeyên jehrî yên kîmyewî li dijî endamên cuda tên bikaranîn. Hin caran pestîsît wekî dermanê çandiniyê jî tê binavkirin lê ev binavkirin ne di cih de ye.  Pestîsît ne dermanê çandiniyê ye lê divê mirov navê dermanê jehrkirina çandiniyê lê bike. Bikaranîna dermanên Pestîsît ne tenê zirarê dide tenduristiya mirovan lê ew zirarê dide jiyana xwezayî jî.

Bikaranîn pestîsîtê di serî de jin û zarok bandoreke mezin li tenduristiya mirovan dike û dikare bibe sedema wendabûna cureyên biyolojîk û rê li ber wê yekê vebike ku madeyên kîmyewî bikevin nav av û axê.

Problema herî sereke ku bikaranîna pestîsîtan li pey xwe dihêle ji alî zirara li tenduristiya mirovan  ew e ku bermahiyên xwe li ser fêkî û şînkahiyan dihêle.

Li gorî daneyên saziya statistîkê a Yekitiya Ewropayê EUROSTAT'ê piştî Spanya, Fransa û Îtalyayê Tirkiye jî di rêza çaremîn de ye ku herî zêde dermanên çandiniyê yên pestîsît lê tê bikaranîn.

Di vê çarçoveyê de divê raya giştî û hemû derdorên pêwendîdar bala xwe bidin ser van 3 xalên girîng: Ewlehiya xurekan, ewlehiya xurekan û serweriya xurekan.

***Ewlehiya xurekan:*** Ji bo ku her kes jiyanake bitendurist bijî divê xurekên biadan, ewle, baş û bipergal bi dest bixe.

***Ewlekariya xurekan:*** Divê madeyên xurekê werin parastin ji dema ku ji zeviyan tên û heta ku digihên cotkaran û digihê xalên firotinê û paşê jî digihê ser sifreya mirov.

***Serweriya xurekan:*** Sekna li hemberî pergala  xurekan a şîrketên endustrîyî, karê û petrolê ye.  Li hemberî polîtîkayên xurekan ên şîrketên çandinî û xurekan ên kurewî, polîtîkayên ên xurekan hildiberînin û pêdiviya wan pê heye diparêze. Mafê diyarkirina pergala xurekan a gel, hilberîna li gor çanda gel û hilberîna hevsengiya bi xwezayê re re diparêze.



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. tvhb.org.tr*

## Pestîsîtên ku jehriya çandiniyê ne divê bên qedexekirin.


- Li cîhanê bikaranîna pestîsîtan nêzî 3 milyon ton e.
- Li gorî lêkolîna Greenpeaceyê ya li Tirkiyeyê kiriye, di 90 berhemên xurekan ên wek firingî, îsotên şîn û xiyaran de ji sedî 14 (%15,6) tespîta bikaranîna bermahiyên pestîsît yên dijqanûnê hatiye kirin.
- Hejmara tespîtkirina pestîsîtên ji heman berheman ku di meha tebaxê de hatibû kirin bi giştî 56 bûn, ev yek di meha cotmehê de bû 96 û lê di meha mijdarê de jî derket 139'an.
- Hejmara bermahiyên pestîsîtan beramberî xurekên ku di dema xwe de tên hilberandin, di xurekên dema xwe de nayên hilberandin hîn zêdetir e.
- Hejmara tespîtên bermahiyên pestîsîtan ên berhemên marketan li gor berhemên ku li bazaran tên firotin hîn zêdetir e.
- Dema li ser hemû mînakên ku hatine girtin analîzek bê kirin ji 90 mînakan ji sedî 52'yê wê, yek an ji yekê zêdetir bermahiyên pestîsîtên ku li ser pergala hormonan bi bandor e, hatiye diyarkirin.
- Ji 57 cureyên pestîsîtên ku ji mînakan hatine tespîtkirin, hat diyarkirin ku ji sedî 21 (12 lib) pergala hormîonî xira dikin.
- Pestîsîtên ku li ser berheman hatine tespîtkirin ji aliyê kêzikên bifeyde, alg, mêşhingivan û zindewarên avî hîn zirartir in.
- Tora Civakî ya Sifreyên Bêjehr ji bo qedexekirina pestîsîtan 125 hezar îmze kom kirin.



*Wêneyê, "Xetere Li Moşena Me - esticewketek Bülent Şık-Greenpeace 2019 "rapora.*

## Ewlehiya xurekan ne pirsgirêka venêranê, pirsgirêka hilberînê ye.

- Wezareta Çandinî û Daristanan ji dêvla pêşxistina ewlehiya xurekan di bin navê 'seferberiya venêrînê' hewl dide feraseta 'berhem bi ewle ne' biafirîne.
- Wezareta Çandinî û Daristanan heta dawiya sala 2020'an destûra bikaranîna şirûbên ku di xurekan de tên bikaranîn û ji bo tenduristiya mirovan bi zirar e, da.
- Di çarçoveya Bernameya Kontrolkirina Salmonella ya Neteweyî ya di bin banê Wezareta Çandinî û Daristanan a Xurekan û Miduriyeta Kontrola Giştî de, di analîzkirina 103.727 nimûneyan de ji sedî 2.9 salmonella hatiye tespîtkirin.



*(Fotoğraf Wênêyê © Rocky Mountain Laboratuvarları, NIAID, NIH)*

*Mîkrografiya elektronê ya kontrolkirî ya bi reng hatiye nîşandan a salmonella typhimuriumê ku şaneyên mirovan ên hatine başkirin dagirkirye.*

*Di qutiyên bultenê de bi kurtasî salmonellayan vebêjin û vê dîtbariyê bi kar bînin*

*Salmonella: Cureyeke bakteriyê ye ku rê li ber tîfo, paratîfo û jehrîbûna xurekan vedike.*

## Mafê civakê heye ku bizanibe çi dixwe û vedixwe!


- Bazara kurewî ya xurekên organîk nêzî 105 milyar dolar e.
- Swîsre û Danîmarka ew welat in ku bi 338 dolaran salane serê ferdekî/ê herî zêde ji bo xureken organîk pere xerc dikin.
- Li Tirkeyeyê jî ji bo çandina organîk salane serê ferdekî/ê dolarek tê xerckirin.

## Di navbera newekheviya dahate û ewlehiya xurekan de rasterast têkiliyek heye!

- Îro li cîhanê zêdetirî 820 milyon mirov birçî ne.
- Di bêewlehiya xurekan a astên cuda de nêzî 2 milyar mirov hene.
- Di salên dawîn de piraniya welatên ku ji aliyê aboriyê ve sekinîne, paşve çûne û rêjeya birçîbûnê zêde dibe, ji sedî 80'ê wan ew welatên ku di faliyetên hinarde û hawirdeyan de giraniya xwe dane madeyên xam.
- Li gor daneyên sala 2018'an, ji ber xweykirineke nebaş, 154 milyon zarokên temenê wan di bin 5 salî de ye qama wan kin in.
- Pêşketinên ku ji ber serdestiya xurekan a yekdestiya çandinî ya navneteweyî ya li gelemperiya cîhanê û bandora wê ya li ser buhayên navxweyî, bi taybetî ji bo ewlehiya xurekan zehmettir dibe.
- Yek ji sedemên bingehîn ên bêewlebûna xurekan xizaniya zêde ye.

Li gor rapirsîna rûbirû ya Saziya Ewlehiya Xurekan a Ewropayê (EFSA) ya bi 27.655 hemwelatiyên Ewropayê û bi 1011 hemwelatiyên Tirkiyeyê ya Nîsan-Mijdara 2019'an:

*Pirs: Wek kes tu bi mijara ewlehiya xurekan re çiqas eleqedar î? (Di bersivan de rêjeya kesên tev lê bûne-%- tê nîşandan.)*





*Pirs: Wek kes tu bi mijara ewlehiya xurekan re çiqas eleqedar î? (%)*

| Bersiv: Hûn bi mijara ewlehiya xurekan re eleqedar dibin | AB-YE | TR-TR |
|---|---|---|
| TÊHEV | 41 | 25 |
| **Perwerde (temenê qedandiye)** | | |
| 15- | 33 | 25 |
| 16-19 | 38 | 22 |
| 20+ | 52 | 26 |
| Hîn dixwîne / Hîn jî dixwîne | 32 | 30 |
| **Xwe di nav de dibîne (çîn)** | | |
| Çîna karkeran | 36 | 29 |
| Çîna binnavîn | 38 | 31 |
| Çîna navîn | 45 | 21 |
| Çîna jornavîn | 51 | 33 |
| Çîna jor | 41 | 46 |

Dabeşiya sosyo-demografîk

*Pirs: Ji kerema xwe re bêje, ji yên li jêr kîjan nêzî fikra te ye. (Di bersivan de rêjeya kesên tev lê bûne-%- tê nîşandan.)*




- Di hilbijartina xurekan de fikara we ya sereke ewlebûn e
- Ewlebûn yek ji fikarên we ye
- Der barê ewlebûnê de fikarên we çênabin, ji ber ku hûn ji ewlebûna xurekan bawer in
- Ewlehî we qet bi fikar nake ji ber ku hûn pê bawer in ku laşê we dikare li hemberî xetereyan li ber xwe bide
- Nizane

AB-YE Dirûşmeya hundurîn    TR-TR Dirûşma derveyî


*Pirs: Ji kerema xwe re bêjin, ji mijarên jêr we kîjan bihîstine? Bersiv dikare ji yekê zêdetir bin*

*(Di bersivan de rêjeya kesên tev lê bûne -%- tê nîşandan.)*





*Pirs: Kîjan mijar herî zêde we bi fikar dike? Herî zêde 5 bersiv*

*(Di bersivan de rêjeya kesên tev lê bûne -%- tê nîşandan.)*




*Pirs: Di der barê zanyariyên xetereyên xurekan de hûn ji kîjan çavkaniyên jêr bi ewle ne?*

*(Di bersivan de rêjeya kesên tev lê bûne -%- tê nîşandan.)*



# Jİ BO EWLEHİYA XUREKAN NÊRÎNÊN HDP'E:

- *Divê pestîsîtên ku çandiniyê jehrî dikin bê qedexekirin.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. depositphotos.com*

---

- *Li şûna tovên hîbrîtê, tovên xwezayî bên bikaranîn û ji bo vê yekê polîtîka bên afirandin û di çaçoveya piştgiriya çandiniyê de were destgirtin.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. webanne.com*

---

- *Ji ber rewşên aborî hêza malbatan a kirînê kêm dibe û pêwîst e mudaxaleyê vê rewşê bikin. Lazim e têkildarî ewlehiya xurekan polîtîkayên demdirêj û demkurt bên afirandin.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. turkiyehabermerkezi.com*

---

- *Polîtîkayên ku ji bo bazirganiya xurek tên meşandin, ji bo tenduristiya civakê di çarçoveya ewlehiya xurekan de bên sererastkirin.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû.bioecoactual.com*

---

- *Ji bo ewlehiya xurekan pêk were divê pestîsîtên ku dibin sedema xirabûnên hormonal bên analîzkirin û ev pêwîstiyek e.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. hukukmedeniyeti.org*

---

- *Ewlehiya xurekan di deman demê de parastina taybetiyên xurekan û pêşkeşkirina van xurekan di nav xwe de dihewîne. Di çarçoveya ewlehiya xurekan de, ji bo gel xurekên baş û erzan bi dest bixe divê polîtîka bên pêşxistin.*



*Fotoğraf Wênêyê: Ev bidestxistin bû. gazetevatan.com*

HDP Genel Merkez
Navnîşan: Serokatiya HDP Navnîşan: Barbaros Mah.
Büklüm Cad. Na: 117 06680 Çankaya / Ankara

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ